Swêdî ji bona koçeberan

Mebesta perwerdeyê

Perwerdeya xwendina swêdî ji bona koçeberan (sfi) divê ew mezinên ku li bal wan zanîna bingeha swêdî nîne, derfetê ji rewşên xwe yên têvel û armancên xwe yên kesîn; bi kêrhatina dan û standina devkî û nivîskî ya swêdî di jiyana xwe ya rojane-, civakî-û kar de digel xwendinê bi pêşxînin. Herweha mebesta perwerdeyê zanîna li ser û têgehiştina rêxistina civatê û nirxandinên wê yên bingehîn e jî, da ku întegrasiyana qutabiyan hêsanî bibe, bi çalakî bandorê lê bikin û bi alîkariyê ji bona pêşxistina jiyana civatê, jiyana kar û kultûrê li Swêdê rabin. Herweha mebesta perwerdeyê dixwaze bi agehdariyê û rêberiya qutabiyan rabe; ya ko dihêle plandanîna perwerdeyê, kar û fêrbûna jiyana rojane ji hewcedariyên xwe û armancên xwendinê bête berdewam kirin.

Armanc

Divê xwendegeh bixebite da ku qutabî

- şîn û meraqê di xwe de bibîne, ku ew xwe fêrî zimanê swêdî bike, ku wêribe û karibe ziman di rewşên têvel de bi kar bîne,
- bi kêrhatina xwe bi pêş xîne ku ew karibe bi swêdî di jiyana rojane-, civatê- û kar de bi peyîftin û nivîsînê bide û bistîne,
- stratejiyê ji bona berdewambûna fêrbûnê û herweha di nav perwedeyê û dorûberê de jî bi pêş xîne û bi kêrhartina xwe bi pêş xîne çi bi tenê û çi bi hevkariya yên din bi plandanîna fêrkirina xwe rabe,
- bi kêrhatina xwe bi pêş xîne ku ew bi danberhevê di navbera zanîna xwe ya li ser ziman , kultûr, jiyana civatê-û kar û bi zimanê swêdî û rewşê ve li Swêdê rabe,
- zanînê li ser jiyan civatê, jiyan kar û xwendinê li Swêdê bi pêş xîne û ji rewşa jiyanê bi plan danîna berdewamiya fêrkirinê rabe. û
- Zanînê li ser prînsîpên demokratiyê û formên kar digel nirxên bingehîn di civata swêdî de bi pêş xîne.

Karakterê perwerdeyê û biniyandanînê

Sfi karakterîze dibe ku qutabî zanîna ziman û zanîna xwe li ser civatê li welatekî ku ew ziman li wir tê peyîftin bi pêş xîne. Dorûber jêdereke bê dawî ye û dîtinine guhêrbar in; ji jiyana civatê, jiyana kar û kultûrê li Swêdê ku ew întegreyî perwerdeyê dibin. Perwerde derfetê dide qutabî ku ew stratejiyan bê qutbûn bi pêş xîne, ku ew bi alîkariya dorûbera peyîftinê û swêdiya nivîsandî ew dikare zanînên xwe di swêdî de û zanînên xwe li ser têgehiştina xwe ji jiyana rojane, civatê û jiyana kar li Swêdê ava bike. Zimanên zikmakî yên têvel, zanînên ziman yên din, zanînên pîşe, paşbingehên perwerdeyê digel meraq û hewcedariyên qutabiyan ew xalên destpêkê yên perwedeyê ne. Di nav perwerdeyê de; têbîniyên zimanê swêdî û rewşa li Swêdê di danberheva zimanê zikmakî û serpêhatiyên xwe de ji jiyna rojane û- civatê digel kar heye.

Herweha perwerdeya di nav sfi de paşbingehek jî dide û perspektivek firehtir di warên têvel yên civatê û kultûrbêjan de dide yên ko qutabî pêrgînî wan dibin. Di nav perwerdeyê de herdu berjewendiyên ziman û sextîkirina naveroka ku ziman pêşkêş dike jî heye.

Di nav perwerdeyê de qutabî bi pêşxistineke piralî radibe, bi kêrhatina kommunîkatîv ya ko ji kompetensên curecur ava dibe. Bi kêrhatina fêrbûna forma ziman jî di nav de ye, herweha prosodî(zanîna hûnandina helbestan), frasiyolojî, komika bêjeyan, sazkirina peyvan, gramatîk û rastnivîsîn. Kompetensa ku mirov zimanekî tam hevgirêdayî saz bike tê bi pêşxistin û bi kêrhatina qutabî her û her digunce û li goreyî rewşê û wergîr baştir dibe. Dema ku zanîna ziman bi xwe têra nake, hîngê qutabî bi hacetî ye, ku ji berdêlê ve stratejiyê bi kar bîne wek formelîkirin, hevmaneyan, pirs û işmaran (livên lebatên laş).

Bi kêrhatina ku ronîvedan bi ser wekhevî û cudabûna di navbera zanînên kultûrî yên xwe û kultûrên qutabiyan de biqewimin yên ko li Swêdî rûberî hev dibin, ew di nav perwerdeyê de ye û dihêle ku têgehiştin di navbera kultûrên cuda de biqewime û weha bi ber kompetensa navkultûrî ve biçe. Kompetenseke hîn bêtir; şiyarbûna ku fêrkirina ziman çawan bi rê ve diçe. Herweha di nav perwerdeyê de ye, ku mirov ji berdewamiya fêrkirina zimanê swêdî û jiyana- rojane-, civatê û kar re li Swêdê planekê dayîne.

Xwendina zimanê swêdî ji bona koçeberan berê xwe dide, ew qutabiyên ku ji wan re armancên curecur yên xwendinê hene û dibe ku di navbera wan de gelekî cudabûn hebe, bo nimûne paşbingeha perwerdeyê, jiyan- û zanînên pîşe û temenê wan. Ji ber vê perwerde bi sê awayên têvel hatiye li darxistin. Riyên xwendinê yên têvel ji sfi 1, sfi2 û sfi3 re berê xwe dide wan qutabiyên ku paşbingeh, rewş û armancên wan yên têvel hene. Her yek ji riyên xwendinê ji kursên cuda pêk tên, ku ew bi aşkareyî pêşindeya perwerdeyê nîşan dide. Derfeta qutabî heye ku ew di nav re plana xwendinên xwe bi alîkariya armancên ku ew dikare xwe di nav demeke maqûl de bi wan gihîne dayîne.

Kursên A û B di nav riya xwendina sfi1de ne, kursên B û C digel kursên C û D di nav sfi 2 de ne. Herweha di nav du kursan de jî gelek riyên xwendinê hene. Ew bi riya xwendinê ve girêdayî ye, dibe ku her yek ji wan herdu kursan be, kursa B û kursa C, dibe ku ew kursa destpêkirinê an kursa berdewamkirinê be. Dema ku kurs ya destpêkirinê be û ya berdewamkirinê be armanca kursê eynî ye, lê forma kursê yekcar cuda ye, ew bi riya xwendinê ve girêdayî ye. Rewşên qutabî û armanca xwendinê cuda ne

SFI1071 – Kurs A

Armanca ku divê qutabî bi wan gihîne piştî dawîhatina kursê

Divê qutabî

- wêribe bi devkî bi dan û standinê di rewşên rojane yên asayî de û karibe bi wergerandin û bi karanîna hin peyamên nivîskî rabe,
- Karibe xwe bi awayên cuda fêrî swêdî bike, çi di nav perwerdeyê de û çi jî di jiyana rojane de,
- Karibe bi devkî bi awayekî asayî zanîna û ezmûna xwe bide salixdan, û
- erkên giring yên civatê û qanûn û qaîdeyên bingehîn yên Swêdê binase.

Pîvanên şehadetnameyê

Pîvanên ji bona şehadetnameyê Baş

Kursa A:

- Qutabî li pey telîmateke devkî diçe.
- Qutabî beşdar dibe û dike ku ew di hevpeyîftina asayî li ser rojaneyê û madeyên gelekî nas tê bigehe.
- qutabî bi devkî, têgehiştî û digel hinek hevgirêdan, li ser tiştekî ku pê re qewimiye dipeyîve.
- Qutabî bi hin rewşên rojane re dide û distîne li wir nivîsîn jî heye.
- Qutabî hin nimûneyan dide ku çawan fêrbûna ziman bi rê ve diçe.
- Qutabî nimûneyan li ser ezmûna jiyana civatê-, rojane- û kar li Swêdê dide.
- Qutabî nimûneyan li ser qanûnên bingehîn û qaîdeyan li Swêdê dide

SFI1072 – Kurs B

Armanca ku divê qutabî bi wan gihîne piştî dawîhatina kursê

Divê qutabî

– wêribe û karibe bi devkî bi dan û standinê û digel nivîsên asayî li ser pêwendiyên rojane û ji bona rewşên pîşeyî yên ferd rabe,

– da ku xwe fêrî swêdî bike, karibe awayên cuda prove û komentar bike,

– karibe zanîn û ezmûna xwe salix bide û wê bide ber jiyana li Swêdê, û

– jiyana civatê li Swêdê binase û zanînê bi dest xwe xîne ku çawan nirxandinên demokratî di civata swêdê şopên xwe dihêlin.

Pîvanên şehadetnameyê

Pîvanên ji bona şehadetnameyê Baş

Kursa B:

– Qutabî têbigehe û bingeha aşkere li ser madeya nas ji nû ve bibêje.

– qutabî agehdariyê bi awayekî têgehiştî bi tekstên rojane ji nû ve bibêje.

– Qutabî bi awayên cuda li hevpeyvînê ji bona hevgirêdana rojane beşdar bibe.

– qutabî bi devkî bibêje û agehdariyê bide û bi aşkereyî ku tiştek ji bona qutabî gelekî nes e.

– Qutabî bi nivîskî bi dan û standinê rabe; bo nimûne di riya ku ew haydariyên asayî binivîsîne.

– Qutabî komentarê li ser fêrkirina xwe bide.

– Qutabî ji nû ve bipeyîve û roniyê bide ser ezmûnên xwe ji nav jiyana civatê-, rojane- û kar li Swêdê

– Qutabî nimûneyan li ser nirxandinên bingeha demokratiyê bide ku ew çawan şopê li ser civata swêdî dihêlin bo nimûne azadiya peyîftinê, wekheviyê û mafên zarokan.

SFI1073 – Kurs C

Armanca ku divê qutabî bi wan gihîne piştî dawîhatina kursê

Divê qutabî

– karibe bi devkî û nivîskî di rewşên asayî de di jiyana rojane-, civatê- û kar de bi dan û standinê rabe,

– karibe stratejiyên cuda bi kar bîne da ku xwe fêrî swêdî bike û ezmûnê bigire ku bi plandanîna fêrkirina xwe rabe,

– karibe ezmûnên xwe yên ziman, jiyana rojane û kultûrê salix bide û wê bide ber rewşên cuda li Swêdê, û

– zanîna wî/ê li ser jiyana rojane-, civatê û- kar li Swêdê hebe û maf û erkên xwe nas bike.

Pîvanên şehadetnameyê

Pîvanên ji bona şehadetnameyê Baş

Kursa C:

– Qutabî naveroka serekîn li peyhev bibêje, bi peyîftina aşkere li ser madeyeke nas

– Qutabî beşdarî hevpeyîftin û guftûgoyê ji karatereke rojane li ser madeya nas bibe

– Da ku qutabî ezmûn û dîtinan rabigehîne, ew li peyhev û têgehiştî, tiştên di dilê xwe de bi devkî û nivîskî dibêje.

– Qutabî agehdariya nazik û telîmatên nivîsandî digel wêneyên grafîkî, diygram û cedwelan bi asayî dixwîne û werdigerîne.

– Qutabî dixwîne û bi komentarên asayî, rojane, peyîftî an tekstên salixdayî digel hin tekstên lîtratûra bedew di nav warên baş naskirî de pê radibe.
– Da ku qutabî bipeyîve an tiştekî rojane-, xwendinê- û rewşên kar salix bide, ew tiştên di dilê xwe de bi ninvîskî, têgehştî û bi forma li peyhev dibêje.
– Qutabî roniyê davêje ser awayê fêrbûna xwe ya swêdî, û hin stratejiyan salix dide yên ko ber dewamkirina fêrbûna ziman hêsanî dikin.
– Qutabî bi guftûgoya jiyana rojane-, civatê û kar radibe û ew wê dide ber welatên din.
– Qutabî ezmûnên xwe li ser nirxandinên demokratiyê, mafan û erkên civatê salix dide, ew nimûneyan tîne, û dide ber welatên din.

SFI1074 – Kurs D

Armanca ku divê qutabî bi wan gihîne piştî dawîhatina kursê

Divê qutabî

– karibe bi devkî û nivîskî di rewşên jiyana rojane-, civatê- û kar de bi dan û standinê rabe,
– karibe stratejiyên cuda bi kar bîne, da ku xwe fêrî swêdî bike û karibe planê ji fêrkirina xwe re dayîne,
– karibe ezmûnên xwe û yên din li ser ziman, kultûrê, û jiyana civatê- û kar li Swêdê û li welatekî din bide ber hev, û
– zanîna wî/ê li ser ku çawan civata swêdî avakirî ye û bi rê ve diçe digel norm û nirxandinan, mafan û erkan hebe.

Pîvanên şehadetnameyê

Pîvanên ji bona şehadetnameyê Baş

Kursa D:

– Qutabî naverokê li ser madeyeke nas bi gotareke li peyhev dibêje.
– Qutabî bi çalakî li hevpeyîftin û guftûgoyê li ser jiyana rojane-, kar- û civatê beşdar dibe.
– Qutabî bi aşkereyî û têgehiştî û bi hinek guhartina di ziman de li peyhev bi gotin û nivîskî tiştên di dilê xwe de dibêje û di vê derbarê de bîr û bawerî û dîtininên xwe yên kesîn dibêje.
– Qutabî dixwîne û berjewendiyê ji awayên cudea di tekstan de dibîne, û roniyê dide ser naverok û mebestê.
– Qutabî bi danberhevê di navbera ezmûnên xwe yên ziman, kultûrê, jiyana civatê- û kar û yên din de radibe.
– Qutabî bi salixdanê radibe ku çawan nirxandinên demokratiyê xwe berdidin nav wijdana ci vatê, û mafên bingehîn û erkan derpêş dike.